




ME BI CIWANTÎ DESTPÊKIR EMÊ BI CIWANTÎ SERBIKEVIN

CIWANÊN ŞOREŞGER

TİRMEH.2021

KOVARA MEHANE YA TEVGERA CIWANÊN ŞOREŞGER Û SÙRIYÊ

HEJMAR:4



EMÊ BI CIWANTÎ ŞERÊ GELE
ŞOREŞGERÎRÊXISTIN BIKIN,
ŞOREŞA ÇANDÎ MISOGER BIKIN

“MAMREŞO” WÊ DÎROKÊ BINIVISîNE



23.04.2021 / Avaşîn / Şeva operasyonê

Kesek şaş nema. Ne rewşeke wiha bû ku tiştekî kesî nedipa hate jiyîn. Ji ber ku gerîlayan dijminê xwe nas kiribû, nexusim li Avaşînê ku çar hêlê wê bi dijmin dorpêçkirî ye, li cihekî ku bi dijmin re di zik hev de ne, kesek ne xerîbê kirina wê bû û ya tiştên ku wê bikira. Ji ber ku em hem hazır bûn, hem li baran dijmin hinekî tinazokî û hem jî bi tevdîr bûn. Ji mêt ve me hazırî ji bo operasyoneke Nîsanê kiribû. Tenê nehatibû zelalkirin bê ka operasyoike pêkan wê li ku derê, li ser kîjan qadê be. 23'ye Nîsanê, êvarî piştî saet 7'an balafirên şer Qertal, Geliyê Basta, Geliyê Avaşînê, Girê Sor, Mamreşo, Werxelê, Aris Faris, Dola Konferansê û Şûkê da ber bombeyan. Balafirên şer jixwe

her roj bi pergal li ser vê devera weke bihiştê, mîna zebaniyan diûn û idhatin û her carê hevalan digot, ‘Ev lêdan ne ji bo xêrê ne’. Dema ku êrişa hewayî anîn em li kampaya Şehîd Şoreş a li Geliyê Basyayê bûn ku hema li pêşberî Girê Mamreşo bû. Balafiran bêrawest erazi bombe dikir, qiyameta piştî bi çend dequeyan digot. Dema ku dijmin bi obûs û hawan li qadê da, êdi mêt pê derxistibû bê ka operasyon wê were ser ku. Hevalek ku nû hatibû qadê çek û rextêne me yên li mangayê anîbû û gotibû, ‘Heval zû rabin, dijmin leşkeran dadixe’, dema ku wiha got, tişta ku me pêşî gotibû ev bû:

“Mamreşo wê dîrokê binivisîne...”

Piştî demek drêj ji we durketin, em pir şadin ku bi hejmarek nu ya Kovara "Ciwanên Şoreşger" careke din dighêjin ber çavêن xwendevanan.

Kovara me êdî bi berdewamî, mehane wê bighêje ber destên we.

Meha Tîrmehê ji bona gelê me wateyeke xwe yê pir giring heye. Meha kuştina teslîmiyetê ye, di vê mehê de îradeya faşîzmê, bi berxwedana 14'ê Tirmehê ê di pêşengtiya Kemal'an, Xeyrî'an, Akîf'an û Alî'an de hat şikandin.

Di vê mehê de û li hîlwanê yekemîn çalakî li dijî îxanet û hevkariyê pêkhat û nokertî derbeya xwe ya yekemîn ji destê tevgera azadiyê xiwariye. Şoreşa Rojava ku bi ramanê Rêber Apo xwe xemilandiye û ji hemî azadîxwazên dunyayê re bûye hêvî di 19'ê Tirmehê de pêkhatiye. Bêguman divê mehê de pêşengên gelê me yêن pir bi nirx ên mîna rêheval "Helmet" û fermandarê ciwanan "Baran Mawa" şehîd bune û gihane asta nemiryê. Ev dîrok mîna xelekên zincîrekê berdewame û di roja me ya îro de jiyan dibe.

Li çiyayêن Kurdistanê û taybet li herêmên Zap, Avaşîn û Metîna li hember dagîrkeriyê her kêlî destan tê nivîsandin. Li hember îxanet û dagirkeryê, sekna şehîdên Mamreşo ji ciwanêن Kurdistanê re ferman dide.

Li hember lîstokên şerê taybet, ku ciwanan xistye hedefa xwe de û dixwaze ji cewhera wan ya tekoşer durbixîne û vala bike, pêwîst dike ciwan çawa tevbigerin? Di analîzêن kovara me de cihêن xwe girtine. Jibo vê jî pêngava "Werin Cenga Azadiyê" ku ji aliyê Komelên Ciwan ve hat ragihandin, erk û berpirsyartiyêن giring ên demê daniye holê. Me hewil daye em giringiya vê pêngavê û erkê ser ciwanan dikeve, bi pespektîfan derxînin holê û biversivînin.

Ciwan bimînin, Ciwan bijîn...

Silav û Rêzêن Şoreşgerî

Edîtorîya Kovara

"Ciwanêن Şoreşger"

NAVEROK



05

Raman
DIVÊ HERÎ ZÊDE CIWAN JI
BO AZADÎ TÊBIKOŞIN!



12

Şerê Gele Şoreşgerî
PRATİKËN ŞERÊ GELÊ
SOREŞGERİ BAŞ FÊM BIKIN
Ü ZAFERÊ BI DEST BIXIN



15

Analiz
ÇAWA BIJÎN?



17

Şerê Taybet
ŞERÊ TAYBETÊ KU DI
DİROKA SURIYÊ DE HATÎ
MEŞANDIN



22


Pespektif
HER KES BI RIHÊ
SEFERBERÎ TEVLÊ BIBE Ü
BIKEVE TEVGERÊ

26

Jinên Ciwan
BÊ TÊKOŞIN BÜYİN JI
JIYANÊ QUT BÜYİNE

29

Portre
ŞEHİD GARZAN EFRÎN



DIVÊ HERÎ ZÊDE CIWAN

Jİ BO AZADÎ TÊBIKOŞIN!

Pêşî girtina ciwanên ku ber bi azadiyê ve dimeşin zehmete. Beşa herî destpêke ku dibine bela yê serê pergalan ciwan in. Ji ber ev yek baş tê zanîn di berdewamiya dîrokê de, di bin navê perwerde yê de ciwan ji qurban kîrinê bigirin heta bi sepandinê ku nayêن heş û xeyalêن mirov re rû bi rû mane. Piştî jinan ciwanan xistina vê rewşê di bilindbûna civaka hîyerarşîk de roleke dîyarker dileyîze. Pergala ku ciwanan girtiye bin kontrolê, vala vala xwe pergala herî bi hêz nahesibîne. Piştî wê ya di tevayî sîstemêن civakêن dewletî de, sipartinêن

dişibin hev li ser ciwanan ferz dîkin. Ciwanêن ku zîhnêن wan bi vî şêwazî hatiye şûştin ji bo her kareke dikare bê bazdan. Şer jî têde dikare pişeyên herî zehmet bigire ser xwe. Li herî pêş ji bo tevahî karêن zehmet tê bikaranîn. Bi kurtasi têkilîya ku çavkaniya xwe ji zaaf û hêza îxtiyaran digire, di girêdan û kontrolkirina ciwanan de ji leza xwe tu tiştek wenda nekiriye û bûye berdawamkerên pergala serdest. Em dîsa bi kirpînin : ciwantî bûyereke fizîkî nîne bûyereke civakî ye. Her wekî jinîtî ku dîyardeyeke civakî ye. Berovajîkirinêن li ser ev dû bûyeran,



bi daketina çavkaniya wan derxistina holê, erka serekî ya zanista civakî ye.

Di tekoşîna civaka demokratîk de, divê hîn xweser nêzîkatî li kategoriya ciwanan bê kirin. Dema ciwan bi civakî dibin bi dafikêne mezin re rû bi rû dimînin. Di aliyekê de mercên kevneşopiya civaka zilamsalarî, di aliyek din de jî dibin merca rêkûpêkiya bîrdoziya fermî de tê hiştin, bi dînamîzma xwe ji nûbûyînan re pêkhateyeke wî/wê ya vekirî heye. Li hember tiştên çêdibin, heta dawî rewale (toy). Di bin bandora civaka extiyar de ji zanebûna tiştên jê re hatiye

**“ Perwerdekirina
ciwanan ked û sebreke
mezin dixwaze.
Beramber vê xwediyê
cewherek wisa ye,
ku bi dînamîzma xwe
destanan binivîsîne. ”**

veqetandin dûr e. Beramber dek û dolabêن civaka kapîtalîst ku heşê mirov dibe, nikare nefes jî bigire. Ev rastî, ji bo ciwanan perwedeyên xweser, ji xefikan vekêşîner, li gor cewhera wan û perwerdeyên civakî mîsoger dike. Perwerdekirina ciwanan ked û sebreke mezin dixwaze. Beramber vê xwediyê cewherek wisa ye ku bi dînamîzma xwe destanan binivîsîne. Dema armanç û rîbaz baş têbigihîje, kareke ku sernexe nîne. Dema armanç û rîbaz weke dîsîplîna jiyanî dît û seferber bû, sebir û riq ji kêm neke, dê pêşketinê dozêن dîrokî de xwedî risteke mezin bibe.

Tevgera civakî ku dinav de hêza ciwanan nebe şansê wê yê serkeftinê kême. Tecrubeyên mirovên pîr û hêza ciwanan di herdemê dîrokê de xwe daye nîşandan. Kesên ku girêdana van her du diyardeyan rast pêş dixin, di meşa wan de jî îhtîmala serkeftinê hertim bilind bûye. Ji bo ciwanê roja me xeyalêن mezin tenê ji qeyrana pergala civakê çawan derkevin re girêdayi be wate hildigire. Ciwanê ku xeyalêن wan tune ji rê derketinê û ji jiyanê wendakirinê tenê bi gîhîştina xeyalêن rasti dikarin rizgar bibin. Rewşa kaotîk a qeyrana dawîya pergala kapîtalîzmê fêmkirin ji bo ciwanan merca xwe pêngav pêşxistin e. Bi vê ve girêdayî fêm kirina nirxên demokratîk, ekolojîk û azadiya zayendi a civakê dê derfetekê serkeftina dîrokî bide destê ciwanan. Di aliyekî de pêkhateya xwe rast pêşxistinê ve di aliyekî din de jî pêşxistina civaka tê bêrikirin û tê xwastin de dê bibe xwedî risteke girîng. Her tişt bi pêngava civaka dîrokî ve xwe ji nû ve rast û baş tevlî kirina ciwanan diyar bibe.

Di civaka hîyerarşîk de pêwîste bi girîngî qala çewsandin û dana girêdana pîremêrên bi ezmûn ku li ser ciwanan dane meşandin bikin. Ev mijara ku bi navê jerontokrasî derbasê lîteratûrê dibe rastiyeyeke. Ji milêkî ve ezmûn îxtiyaran bi hêz dike, ji milekî din ve îxtiyarbûn her diçe wan lawaz û bêhêz dike. Van taybetmendîyên îxtiyaran, ji bo ciwanan bigirin bin xizmeta xwe wan bin zextekî de dihêle. Vê kirarî(îşlemê) bi tijekirina zîhnêن ciwanan pêş dixin. Tevahî liv û tevgerên ciwanan bi xwe ve girê didin. Zilamsalarî ji vê dîyarde yê hêzeke mezin digire. Bi bikaranîna hêzên cesteyî ya ciwanan daxwazîyên xwe dikarin bidine

kirin. Pêvegirêdanbûn a ciwanan heta roja me bi kûrbûyînê berdewam kiriye. Serdestiya ezmûn û bîrdozî bi hêsanî nikare bê şikandin. Xwesteka ciwanan ya azadiyê çavkaniya xwe ji vê dîyarde ya dîrokî digire. Ji zanayê extîyar heta mirov û saziyê zanista roja me, beşen zanyarî a ku tê gotin ên herî hessas û stratejîk in, ji ciwanan re nayê dayîn. Zanyarîyên ku tê dayîn ciwanan hîn zêdetir ditevizîne û pêvegirêdayîbûna wan mayînde dike. Demazanyarî bê dayînjî amûrêñ sepandinê nayê dayîn. Ewiqandineke domdar taktîkekî revebirinê a nayê guhertin e. Stratejî û taktîkên li ser jinan hatiye meşandin,

propagandayêñ
bîrdozî û polîtîk

û pergalêñ
çewisandinêji
bo ciwanan jî
derbas dare.

Daxwaziya
a z a d i y a
h e r d e m î
a ciwanan
ji sinurêñ
temenê fizîkî
nayê, ev ji rewşa
çewisîna xweser a

civakî tê. Têgehêñ serxweş,
rewal (toy) û xwingerm, ji bo biçûkxistina
ciwanan di bingeha propagandayê de
lihevanîne. Dîsa zû bi zû girêdana bi
ajoyêñ zayendî, kişandina serkêsiyê,
girêdana bi dogmayêñ hişk yêñ
jiberkirinê, ji bo pêsiya enerjiya ciwanan
a beramber pergalê bigrin û rîkûpêkiyê
bi tendurist bikin ve girêdayî ye.

Ji armancêñ herî girêng a şeran yek jî
ewe ku wek malêñ herî bi nirx zarokan û
ciwanan ji bo hûndirê xwe de bihelînin



Rêxistin buyîn bi rexmê hemî texrîbatan, hebuna xwe bi awayek mezin li hemî beşen Kurdistanê derxistiye

çê kirina ocaxêñ quraftînê
ye(devşîrme) û çê jî dikin.
Bingeha burokrasiya seretayî
wisa destpêdike, dîroka
şaristanî ji milekî ve bi vî rîbazê
hem civakê lawaz dike hem jî
çalakiya pekanîna hêza amûrêñ
burokratîk e : beramber civak civak
çekirin; beramber civaka xwezayî civaka
dewlet û îktîdar çê kirin . Di vê pêk hateyê
de zarok û ciwanêñ ku ji civaka xwe ya
cewheriqut bune reziman, çand û dîrokeke
cûda tê fêr kirin. Bîyanî kirina cewhera
xwe hedefa esasî ye. Bê îktîdar jiyankirina
wan tê negengaz kirin. Hem bîrdozî hem
maddî nasnameya heri dewletî tê ava kirin.
Ji bo hebûna wan rîya derbasdar tenê
dibe dewlet û îktîdar. Hem xwe dewlet



û îktîdar dihesibînin, hem jî bi vê awayî bi civaka xwezayî re têñ dijî hev. Carna civaka dewlet û xwezaya civakî wekhev dîkin. Ev şas e, bi nakok e. Dîroka şaristanî li ser vê nakokiyê hatiye damezrandin. Di bin gasp kirina perwerdeyê de ev rastiyêñ dîrokî hene. Heke na beramber civakê erka perwerde di xema wan de nîne. Xwediyyê sermayeyekî karkerêñ xwe ci qas perwerde bike îktîdar jî bi vî ferasetê, wek

wisa tê sazikirin. Burjuwazî di aliyê perwerde da çîna ku herî zêde li ser civakê deshilatdariya xwe dide meşandin e. Perwerdeya seretayî û navendî, kesen ku di xwazin bikevin kareke belgeya zaningehe li ser ferz dîkin. Ev yek jî li ser ciwanêñ civakê ji xwe durketin, bi sîstemê ve hatina girêdan û pêvajoya ketina qafesê ferz dike. Zordestî, hêza maddi û perwerde ji bo dagirkirina civakê çeka herî bi hêzin.

D i



evd û karkerêñ xwe perwerde dike. Navê vê burokrasî jî be, endamên wî ji asta herî jêr heta herî jor wek evd têñ gihadin.

Bi taybet îktidara netew-dewlet deshilatdariya xwe li ser zarokan û ciwanan bi rîya perwerde pêşdice. Bi zihnyeta xwe ya olî, dirokî, hunerî, û felsefîk mirovêñ ku di afirîne êdî ne yê malbata xwe ya berê ne, ew kes êdi a deshilatdariyê ne, mulkêñ wan e. Ji xwe durketina mezin

dîroka şaristaniyê de dewlet û îktidar şerê ku meşandine de derbeya herî mezin bi rîya perwerde li civak daye. Pêkanina mafê perwerde ji bo civak mafê ku pêkanîna wî herî zehmet e ye. Beramber hêza deshilatdar û netew-dewlet bi rîya perwerde hebûna civaka xwe pêkanîn ketiye pêvajoya herî zehmet a dirokê. Deshilatdariya bîrdozî bi şoreşa xwe ya dawî a ragihandinê li ser civakê

bi şerê çapemeniyê (ji ber mêtîngeriyê qasê leşkerî û aborî heta ji wan bi héztir rêve dibe) ve hin serkeftîtit û ji nû ve metîngeriya çandî bi rê ve dibe. Li hember dagirkérî û deshilatdariya çandi ku li ser civakê dimeşinin amûra herî giring a hebûnê bi tekoşina politik û bi exlaqa xwe yê cewherî berxwedan e ev yek tenê rêya azadî û rizgariyê ye. Civaka ku ciwanên xwe wenda kirîye an jî berovajî vê ciwanên ku civaka xwe wenda kiribe ji bilî têk çûnê tê wate ya wenda kirina mafê xwe yê hebûnê û îxanet kirina wî ye. Pişti wê jî rizandin, belavbuyîn, tunebuyîn tê. Beramber vê erka civakî ya bingehîn amûra bingehin a hebuna xwe wate, saziyên xwe yên

kevneşopî yên xwe, li gor taybetmendiyêñ xwe ya xweza ya civakî mezin kirin, veguherandina xwe mijareke jiyanî ye ; pirsgirêka berdewamî ya hebûna xwe ye. Tu civakekî mafê xwe yê hebûnê bi vê ve girêdayî erka perwerde kirina ciwanên xwe nikare bi hêzeke din ve parve bike an jî dewr bike. Hêza mijara gotinê dewlet an jî amûrên iktidarêñ cûda be jî ev erk û mafê xwe nikare dewr bike. Berovajî vê dê wek radestî deshilat bûye bê hesibandin. Pîrozbûna mafê perwerde çavkaniya xwe ji hebûnê digire. Tu hêz, di serî de qasê dê û bav, qasê civak nikare nêzîkê ciwanan bibe û bi qasê wan pêwîsiya nêzikbûnê bibîne. Şarstaniyan di berdewamiya dîrokê

Di dîroka Şaristaniyê de dewlet û desthilat, di şerê ku meşandine de, derbeya herî mezin bi rêya perwerdeyê li civakê daye.

perwerdehî pêşxistine. Di vî alî de naveroka nirxandinêñ xwe ji milê ziman, huner, ol û felsefe yê ji pêkhate ya zanist û iktidarê cuda kirine. Şoreşa wateya serxistine. Ji derveyê vê pêşxistina hebûna xwe ya civakî û naveroka wê politik û exlaqî ne gengaz e.

Perwerde, bi zanyariyêñ teorîk û pratîk ezmûnêñ civak ji endamên civak re bi taybetî ji ciwanan re, hewldana fêr kirinê ye. Civakî bûna zarokan bi karîgeriya perwerde ya civakê diyar dibe. Perwerde kirina zarokan ne erka iktîdar û dewletê ye, erka herî girîng a civakê ye. Ji ber zarok û ciwan ên civakê ne. Hem wek maf û hem jî wek erk, zarok û ciwanên xwe bi

de bi çalakiya qût kirina zarok û ciwanan ji civak, dijayetiyeç mezin beramber civak pêş xistiye. Vê çalakî yê bi du şêwazê pêk tîne : An mezinêñ wan tune û kole dike, an jî ji bo iktîdara xwe bikar bîne; qaço bi armanca perwerde digirin gel xwe.

Ji dibistanêñ seretayî heya zanîngehê perwerdeyêñ fermî yên ku têne ferzkirin di milê naverok û cewherê de li ser kesayet, civakê û mirovêñ ji derdorê xwe durketîñ û li gorî dewlet û deshilatdariyê dimeşî di afirîne. Li dijî ve van tiştek û xefkekê perwerde û perwerde kirin sistemê derbazkririne. Mirov û civakê bi rastiya wê ya dîrokîredayîna naskirin, dayîne azadkirin

û bi pêşerojê re birin û nêrînekî zanistî hunerê mirov paradigmayê weke karên despêkê ji bo şoreşa zîhnî pêwîste weri cewherî kirin û bikevî jiyanê. Dibistanê navendî, amadeyî û haya dawiya zanîngehê xwandin ji bo memurbuyînê weke zilamê dewletê karkirin amadekariyê despêkin.

Zanist xistina sermaye û kirina deshilatdar buye despêka durkirina ji civakê. Em mabed û birtyargehê zanistî ku pirsgirêkan çareserdikin êdî bune cihê pirsgirêk avakirinê, ji xwe durketin û navendên serdestiyan û navendên îdolojike. Niha li ber çavane hindek rewşenbîr hindek tiştan ji ber dikin zêdene, lê belê zanistnasekî civakî rastnîni. Mirov dikare bêje li ber çavane melayên hemdem û melayên zanîngehan pir û zêdene û vana jî ji sofistên demê yên klasîk jî paşketîtirin. Navendên zihnyet avakirinê zanîngeh, akademî, amadeyî, navendî, seretayî û dibistanê dayîkê û bi van ve

girêdayî mizgeft temamdkî qışla (cihê leşkerî) tujtit diki. Van bermayên civakê yên milê zihnyetê, exlaqî

polîtîk, dagirkirin, bi destxistin, pijafit û fetihkirinê nine çiye? Dema ku hindek rewşenbîr dibêjin civak weke komî anîna civakê xistina weke pez vana ne axivîne.

Di roja mede tapinakêni ji vê kaosê derketin çi ku derê û çi bibin ev pirs giringe. Bêguman paşeroj bi texlîtkirinê nayê jiyankirin hema kevneşoopî giringiya xwe heye giringî ji yê nu jî ava nabi. zanîngeh navendên zanistî, saziyên tik-tank, yên nihajî van armanca xizmetkirin pir kême. Vanderan bune cihê kaez û niviştiyên azadiyê belavdikine. Deme li şaristaniya misrê da "senedên rizgarkirina axretê dihatinbelavkirin. Belgayanjîdiplomaweke senedên rizgarkirinê yên vê dinyayê ne".

Bi vî awayî pirsgirêka perwerdê di cewhera xwede saziyên politik û exlaqê pêwîst diki; kare bingehîn yê polîtik û exlaqê ji perwerdeya civakê girtine. Civakekê xwe perwerde neki saziyên xwe yê polîtik û exlaqê cewherî pêşxistin li ser piyan girtin imkanê wê yê ji holê radibi û hebuna wê jî hergav dibi xeteriya jiyanê û rizandin, belavbuna rizgarî dibi. Em carek dibînin ku di bingeha hemû civakan de dewlet yek destda deshilatdarî heye. Qezenc sermaye ev yekdestiya deshilatdariyê nabi nayê meşandin li hemberî tekoşina şaristaniya demoqratîk nebi jî tu pirsgirêkên civakî bi tu awayekî bi şêweyekî mayinde çaresernabi.

Hun jiyanekî çawan dixwazin hun dizanin? Hun ji vê jiyana ku bêhnketiyê ji boy xilasbunekê pêwîste hun çîbîkîn h u

Li şaristaniya misrê da "senedên rizgarkirina axretê dihatinbelavkirin. Belgayanjîdiploma weke senedên rizgarkirinê yên vê dinyayê ne".




dizanin? Hun qirkirina çandî di dîrokê de hun dizanin? Hun qirkirina çandî ji ji qirkirina fîzîkî bi xetertire hun dizanin? Hun bi qirkirina çandîre çawan têkoşîn bikin hun dizanin? Dostê we, dijminê we dizanin nasdikin? Hun ji boy civaka we ji bo gele we qanon û destura demoqratîk pêwîste çawabe dizanin? Divê mijarê de dikarin xebat bikin? Hun dewtura bingehîn ya demoqratîk bi kîjan rîbazê amadedibi dizanin? Hun mafê xwe yê civakî bi kîjan rîbazê bi dest bixin dizanin? Hun yek zarokên xwe jî bi zimanê dayîkê dikarin perwerde bikin? Eger hun van hemuyan nizanibin hun çareseriyê pêşnexin wê deme ezê bêjim ku vana nizanin, nikarin û ser wan reşbikin nagrin berçavan û min heya niha jî ne girtîye.

Rêxistin buyîn bi rexmê hemû texrîbatan hebuna xwe bi awayek mezin desxistiye dinav welat dervey welat û li hemû besên Kurdisatnê potansiyelekê ku bikarbîni û biçi bi her awayî rêxistin kirin bingeha wî derfetê wî yê locistikê, qadro û qederek kom û saziyên civaka sivil hene. Zanîna politikaya viya qederek pêşketiye. PKK yî li hemû deverên Kurdistanê sereke û pêşengê dîsan li dervey welat û metrapolan bi milyonan gelê welatparêz hene, di milê jinêd hişyarbuyînek mezin û rêxistin bunek heye. Derdora adeta cihanek nû dizê. Van nêzikatiyên torîk û pratîkê nû besên wiya bingehîn di azadiya

jinê da derbazdibi. Ciwan jî di rewşek wisan dene ciwanê ku ji germahî eleqeya xwe tiştekî winda nekirine rîwiyên bi biryar yê xeyalên civakê azadkirine. Şîara "yan jiyanek azad yan ji na" ala ku ciwan kete ji deste xwe ne xine ewe.

Hun ji tiştên jiyana kevin û kevin çi hebin pêwîste devjê berdin. Eger cesareta we, zana buna we hebi xeyalên xwe yên



azadiyê nû û şeklê jiyana nû hun avabikin. Zekaya xwe ya hestyarî û zekaya analîtîk hun pêşbixin û bi hevra bikarbînin. Li gorî ku alikarî bidin hevdu û hevdû dewlemend bikin bi kartînin, herkes û hertiş serî heya neynokê pêwîste bi guheri. Pêwîste hun ciwan vê guherînê baş fêmbikin û jiyana xwe jî li gorî vê pêwîste bi guherînin. Xeyalên xwe yên kevin pêwîste daynin aliyekê min jî berê xeyalên mezin difikirîn. Dixwastim bibim pilot û derkevîm asimanîn, piştre min fêm kir ku ev xeyalên zarokanîn, min fêmkir ku li gorî van rastiyân pêwîste em jiyan bikin, hun jî xeyalên xwe, jiyana xwe bi vê dema nûre pêwîste çêbikin.

RÊBER APO

PRATÎKÊN ŞERÊ GELÊ SOREŞGERÎ BAŞ FÊM BIKIN Û ZAFERÊ BI DEST BIXIN



Rêber APO dibêje " xwe naskirin dayîka hemû naskirina ne ". Di Kurdistanê de dagirkeriya heyî, hemû hewildanê wan ew bûye kû gelê Kurd xwe, rastiya xwe nas neke . Ji ber kû xwe naskirin tê wateya; di şexsê xwe de rastiya hemû jîyanê naskirinê. Yanî xwe naskirin dîroka xwe, çanda xwe, zimanê xwe, nirx û pîroziyên xwe û hwd. tevahî naskirinê îfade dike. Yê însan-civak li ser piyan dihêle, zîndî dike, têkoşer dike û bi wate dike jî bê gûman ew rastiye. Her

civakek bê dîrok çawa dikare zindî bimîne, têkoşer û berxwedêr be? Dîrok hafize ye, kok e. Însan ango civak bê dîrok hiştin, tê maneya bê hafiza û bê kok bûyîn. Her çiqas civak zanebûyina dîrokê xûrt be, kur û timî zindî be, ewqas ew ferqa rastiya xwe de ye, zanaye û pêwîstiyêñ kîliyê dikare baş bixwîne û jêre bibe bersiv.

Dema em dibêjin zanabûna dîrokê ev naye wî wateyê, li gor çawa ku pergala çînayetî û desthilatdar, dîrokê wek

kombuyîna zanabûnê kronolojîk digire dest. Ev dest girtin pir şâş û zûhaye. Berovajî, her zanabunek dîrokê baş naskirin û roja îro de jiyanê re xistina yek re watedar dibe û her tim xwe zindî dihêle. Serok APO got "dîrok zindîye – anihaye" ji bo vê yekê lazime em her tim dîrokê analîz û şirove bikin û ders jê der bixin. Jiber ku dîrok ji bo niha û paşerojê re timî perspektîf dide. Zanebûna dîrok jiyan û paşerojê araste dike. Heta mirov dikare bêje ku çavkaniya tecrûbeyê ye. Çavkaniya here esase ku me jiyanê re amade dike. Ji bo wê jî dîrok zindî ye û her berdewame.

Li ser van esasan pêwîste Kurdistanê de tiştê ku qewimîne baş nasbikin, analîz bikin û dersan jê derbixin. Çawa tê zanîn 2010'an de em wek Tevgera Azadîyê me di tekosîna xwe de, stratejîke nû ragihand. Ev stratejî Serok APO wek şerê gelê şoreşgerî bi nav kir, wek serdemek nû girt dest. Li ser pewîstiyê wî stratejîyê her deverên ku em lê hebûn me xwe rêxistin kir. Hin nebesî

Kurdistanê bi berxwedana hate dayîn, asta here jor de rola xwe lêyîstin û nave xwe bi tîpêñ zêrîn, bi dîrokê dan nivîsandin. Eger îro Tevgera Azadîyê ku temamê cîhanê de hatîye nasîn û her hêzek eger ku dixwaze Rojhilata navin de tiştek bike vê tevgerê dihesibine, bê gûman ev saya xeta şerê gelê şoreşgerî, û berxwedana hat dayinê ye. Bi saya şehîd Arînan, Barînan, Avêstayan, Çiyageran, Andokan, Hogiran, Axînan, Feraşînan, Jîyanan û bi dehan egîdêñ kurdistanê ye.

Em jî wek jin û xortêñ ciwanê Kurdistanê pêwîste vê mîrasa heyî rast xwedî derkevin, ders û tecrûbeya heyî baş fembikin, tekosîna xwe di asta herê jor de bimeşînin. Tenê ev tekosîn û berxwedana deh salêñ dawî tena serê xwe jî îspat dike ku serxistin û serkeftina tekosîna Gelêñ Kurdistanê rast femkirin, rêxistinkirina şerê gelê şoreşgerî ve girêdayî ye. Eger ku bi dehan jin u xortêñ cîwanê Kurdistanê bi mehan beramber hezêñ dagirker, faşist û hov ê wekî Daiş

destkeftiyêñ ev salêñ dawîyê hemî encama stratejiya şerê gelê şoreşgerî bû

û kêmasiyêñ xwe hebe jî, destkeftiyêñ ev salêñ dawîyê hemû encama stratejiya şerê gelê şoreşgerî bu.

Mînaka Şex Meqsuda Helebê em bigirin, heta ku şerê ku beramber hêzêñ çete a weke Daîşê, dîsa dijminê hov û faşist a wek dewleta Tirk re tekosîna hat meşandin, hemûyan tecrûbeyekî pir mezin derxist holê. Bi hezaran jin û xortêñ ciwanê

û dewleta Tirk şer kirin, bi tilîlîyêñ ku di qada şer de bilind dibû, piskolojiya dijmin bin û gûhê hev dixist. Hedef û xeyalêñ dijmin wala derxist û qirika wan de hişt. Ji bo wê yekê ye kû îro bi hemî çavşorîyê xwe ve erişê hemû destkeftiyêñ Tevgera Azadîya Kurdistanê dike. Bê gûman em jî wek jin û xortêñ Kurdistanê, tirsa kû Axînan, Arînan, Barînan, Avêstayan, Reşîd



Serdaran, Çiyageran, Qendîlan û Saryayan ku daye avakirin lazime em mezintir bikin. Dijmin baştir nasbikin û li gorê wê rastiyê ji heft salî hetanî heftê salî, hemû civakê rêxistin bikin. Tu kesek, komek, kesîmek li benda tiştek nemînin û hêza xwe û îradeya civakê bawer bikin. Şex Meqsûd, Sur, Cîzîr, Nuseybîn, Ferqîn, Gîmgim, Silopi, Gever, Xacûrt, Hezex, Efrîn, Serêkanîyê, Şeladizê û hwd. hemû vê ji me re ispat û ferz dike. Em xwe di stratejiya şerê gelê şoreşgerî de rêxistin bikin, tecrîda li ser Rêber APO bişkinin û welatê xwe ji bin dagirkirîyê rizgar bikin.

serxistin û serkeftina
têkoşîna Gelên
Kurdistanê rast fêm
kirin, rêxistinkirina
şerê gelê şoreşgerî ve
girêdayî ye

Ç A W A B I J Î N ?

Ez kî me?

Ez kî me? Cihê min yê nav jiyanê de çi ye? Wateya berdewam kirina vê jiyanê ji bo min çiye? Ez pêwîste bi armancek çawa vê bijîm? Me bi wan pirsan ve dest bi lêgerînên azadiyê kir. Bê guman di serê her ciwanekê de, ew pirsana wek sanciyekî cihê xwe girtiye. Pergala ku em di nav de jiyan dikin her tişt normal û asayî nîşan dide. Lê belê hindek caran em wek sancî an jî wek guman dinirxînin. Pirsa ev wê çawa dibe ku rast bibe? Serê me de cihê xwe digirt. Bê zanebun jî be di serê ciwanan de, hindek tist wek pewîstiya rastiya derxistina hole derdiket. Em bawerin her kes van pirsan ji xwe pirsiye. Ji ber ve jî pewistiya bersiva hindek pirsan ji mere heye.

Bersiva pirsa çawa bijîn pêşxistina jiyana şoreşgeriye. Pêwîstiya pêşxistina jiyana şoreşgerî, ji bo hemû kesan wek nan û avê ye.

Ev bersiva pirsa "li şûna vê jiyana kevin, jiyaneye çawa wê were avakirin?" dide. Ev jî dibe sedema di kesayeta mirovek an jî çend mirovan de, civak bi giştî ji nû ve were avakirin-pêşxistin. Ev kesayet, di bingehê de dikare bibe sedema analîzên rastiya dîrokî û civakî. Ev kesayetên hanê, nûnertiya kîjan têkiliyên kevneşop yên dîrokî û

civakî dikin? Vê yekê baş analîz dike. Ev analîz çi qasî bi kûrî, bi bedewî û hunerî



**Bersiva pirsa çawa bijîn
pêşxistina jiyana şoreşgeriye.**

were kirin, ewqasî berhemeye baş dertê holê.

Ev jî bi hêza hunermend ve girêdayî ye. Hinek xeyalên xwe didine xebatê, daxwaz û hesretên xwe tînin zimên. Ez li dijî çi me, çi dixwazim, çi xera dikim, çi ava bikim, çi nebedew e, çi bedew e, çi dikare were jiyandin, çi nayê jiyandin, çi dikare were



pejirandin û çi nayê pejirandin?

Van pirsan bi awakî vekirî dike û bersivê van pirsan jî dîsa bi awakî vekirî dide. Ji bo bersivê van mîna lêgerînvanake heqîqetê têdikoşe. Bersivê van pirsan, civakê bi giştî eleqeder dike.

Ev bingeha romanê ku em dixwazin pêş bixin, di çarçova van pirsan de pirhindik dertê holê. Rastiya îro ku tê jiyandin jî, ev e. Ev rastî çiqas bi paşverûtiyê, dagirkerye û feodalîyê ve girêdayî ye, ewqasî jî modernîzmek e ku şexsan cîla dike, dixwaze bibiriqîne û lê bin vala ye. Ev yek jî derketiye holê. Dîsa welatparêziya sexte, şoreşgeriya sexte û gelo di bin van de kesayet çi ne, çi nîn in? Hatine kifşkirin. Ü bi vê yekê re jî, rizgarbûna civakê bi nasnameya netewî re çawa girêdayî ye,

nûnertiya vê di kesayetekê de çawa dibe û ev kesên ku wê nûnertiye dikin, çawa dertê, çawa têdikoşin? Ev hemû derketine holê. Hindek pirsên dîtir yê vê temam dike hene, bi ve şêwazî wek Réber APO dibêje "Roman" li ser wan bingehan peşdiikeve.

Ji kû ve tê, jiyanâ berê çi ye, veqetandina wê, ji vê jiyanê çawa ye? Û dîsa bi jiyanâ nû ve çawa girêdeyî ye, wê jiyanê çawa çêbikin û hun dixwazin

Dîsa
welatparêziya
sextê, şoreşgeriya
sextê û gelo di bin van
de kesayet çi ne,
çi nîn in? Hatine
kifşkirin.

wê çawa xurtir bikin? Ev pirsên hanê jî tim têne dayîn.

Ji aliyekê ve pêşketin çîma bîlez çenabin, çîma nikarin bibine militanê şoreşger, ev yek di kesayetê de dibe sedema çi? Bi bersivê rast, ji bo van pirsan û ji bo pêşketina şoreşê, erkê her ciwaneke lêgerê heqîqetê ye ku bibe hêza bersivê.



ŞERÊ TAYBET Û KU DI DÎROKA SÛRIYÊ DE HATÎ MEŞANDIN

Qasim Engîn

Dema em behsa Suriye bikin bêguman pêwîste ewil em bêjin Şam û destpêbikin. Anglo Suriya bê Şamê bê wateye. Şam ango Cennetü'l-Arz bi gotinên me ji Şamê re "Bihûsta li ser cîhanê" tê gotin. Yek ji neviyên Sam kûrê Nuh ji ber ku navê xwe Dîmaşk bûye, Şam re Dîmaşk hatiye gotine. Lê hêna balkêstêr ew e ku, li gore

gotinan kûrê Adem Kabîl, Habîl li Şam de li ser çiyayê Kâsiyûn de kuştîye. Û em jî dizanin ku li gore vê mîtolojiyê; xirabî, kuştin, êş, azar ango kutuya pandora bi vê bûyera vebûye, destpêkiriye û hêna jî bênavber ev xirabî û kuştina bi hovane dom dike.

Gelo çîroka Kabîl û Habîl ya ku li ser



serê bajarê Şam de destpêkiriye ma îro ji li seranserê Suriye de dom nake? Suriye ya ku îro tevahî bûye xwîn û cihê kuştinê gelo nifireke?

Bêguman derbarê vê xirabî û kuştina destpêkê de ger lêkolînek fireh were kirin û were nivîsandin, gelek tiştên pir balkêş yê rastiya vê bûyerê jî ji xwe re bîne.

Lê mijara me ne ew e, mijara me Şerê Taybete ku ya çi di dîroka Suriye de, çi dema Fransiyan de û çi di dema Suriya beriya Hafiz Esad û pê wî de, rê û rîbazên ku di milê Şerê Taybet û Şerê Derûnî de hatine destgirtine.

Berê dema ku Sûrî dihate gotin; Suriye îro, Lûbnan, Filistin û axa Urdun jî ser de

*Suriye ya ku îro
tevahî bûye xwîn
û cihê kuştinê gelo
nifireke?*

dihate fêmkirin. Hinek caran jî ji bo Suriye Ereba Bîladî Şam an jî Arzu-î Şam wek nav hatiye bi lêv kirine.

Tê gotin ku ji bo nav lêkirina Suriye sê nêrîn henin.

Yek, Ji ber ku berê li vir Asûran hukum

kirine jê re Asurya hatiye gotine û bi demê re ev gotina bûya Suriya.

Dûyem, Berê li vir bi şêweyekê zêde Sûryan jiyane, û bi demê re gotina Suriya ango Suriye pêşketiye.

Sêyem jî ji ber ku bajarê Sur yê ku îro li ser Lûbnanê de li peravên Bahraspiye de berê li ser vê herême dihate hesibandine, demê re ji bo vê herêmê Suriye hatiye gotine.

Êdî kujan nav rast an ne rast bibe îro herkes ji bo vê herêmê navê Suriye kar

ya Suriye, Suriye terikandiya û li gore berê him nûfus pir kêm maye him jî şert û mercen jiyanê li Suriye de giran bûne. Bi gotinek din tam kaosek jîn dibe.

Dîsa, sîstema Suriye li ser 14 wîlayetan ango Muhabaza'yan bûye. Lê sibê yê çi bibe hêna ne diyar e.

Dema behsa ax û dîroka Suriye were kirin bêguman bêyi ku behsa Çanda Tel Halaf ango Çanda Neolîtîk were kirin, wateya Suriye namîne. Her wiha dema ku behsa Suriye bikin pêwîste ku behsa Çanda El Obeyd ango Çanda Mêrperwerî,



tîne û em jî Suriye dibêjin.

Berê rûbera Suriye 185 180 km çarqoşe bû û niştecîhên xwe navbera 21 û 25 milyon bûn. Lê ji ber şerê ku wa 8 salan dom dike axak mezin ya Suriye di milê Tirkan ve hatiye dagirkirine. Ü yek jî çi ber erîşen Rejîma Baas û çi jî bi leystokên taybet ê hêzên hegemon nufusek mezin

Desthilatdarî, Bajar, Çîn û Dewlet jî were kirin. Ji ber ku yek jî herêma ku herê zêde çanda Şarîstanî -Şarîstanî di wateya desthilatdarî û dewlet de, ne di watêya çandî ano jiyar de- jiyaye, yek jî ev herêma ye. Şerê çanda Aryenî û Semîtîk herî zêde li ser vê axê rû daye. Ango Şerê nava çanda dayîk û mîr perwerî herî zêde li vir bi dijwarî meşaye.



wan ango paytaxta wan jî Şam bû.

Vala vala her carê Erdoxan behsa vexwarina çayê li Camiya Emeviyan nake. Çawa ku iro li Enqere Erdoxan qasrek xwe bi hezar û sed mezel heye, di demê xwe de Muaviye jî li Şam quesra Kesk jî xwe re avakirîbû. Bêguman bi pêreyên dizî ango şelandî. Heman wek Erdoxan kirî...

Dema Şam were gotin bêguman pêwîste kirinên qirêj bi sedan salan ên Abbasian jî were bi lêvkirin. Ji bo kesên ku dixwazin

Hîç guman nîne ku yek jî hêza ku herî zêde bi Şam û Suriye ve girêdayî, bi kirinên herî qirêj û kirêt were ser ziman yek jî Osmaniyêن hov in.

Hamûrabî, Babîl, Fars, Yewnan, Roma'yî, Part û Sasaniyan jî bikin.

Dîsa dema ku behsa Suriye û Şam ango Dîmaşk were kirin ma gengaz e ku behsa Hz Îsa nekin û erîşen bi hovane yê bi hezaran salan ên Bîzansiyen nekin?

Di wê manê de dema behsa Şam were kirin yek jî kesê ku herê zêde were bi lêvkirin bêguman ew Musilmanê sexte Muaviyê yê wek Erdoxan e. Bila naye bîra kirin ku, navenda ku herî zêde zerar daye İslame İmparatoriya Emeviyane û navenda

kirinên Abbasian fêm bikin dikarin pirtûkên "Çirokên 1001 Şêv" bixwînin da ku bizanin Harûn Rêşîdê Halîfe ci jî Şam, Suriye û her wiha gelê wê derê kiriye.

Dema Şam û Suriye were gotin bêguman pêwîste erîşen Xacparestan û berxwedana Nureddîn Zengiyê Tirk û Seladdîn Eyyubiyê Kurd jî werin ziman.

Şam û Suriye bêyî ku erîşen hovane yê Moxolan werin bi lêvkirin jî yê kêm bimîne.

Hîç guman nîne ku yek jî hêza ku herî zêde bi Şam û Suriye ve girêdayî, bi

kirinêñ herî qirêj û kirêt were ser ziman yekj jî Osmaniyeñ hov in. Pê re Cemal Paşayê Îttîhat-î Terakkî yê ku dijminê gelê Ereb bû. Ma pir zexmete ku erîşen Tirkêñ faşîst û Tirkêñ Osmaniyeñ bi van rastiyar re girêdayî werin fêmkirin? Bêguman ger em bixwazin him li Suriye û him jî li ser Kurdêñ ku li Suriye de ango Rojava

salêñ 1961'an jî werin ziman. Taybet jî erîşen dijî Kurdan.

Ji bo ku roja îro were fêmkirin pêwîste kêm jî bibe malbata Esad û pê re jî pratîkên Hafiz Esad û kûr Beşar Esad jî were kirin.

Di wê manê de bi protokola ku qaço Mutabakata Adana tê gotin bi kijan rîbazên qirêj dijî Kurdan şer kirine jî



de jiyanê texrîbatêñ piştî Şerê Cîhanê yê Yekem fêm bikin, pêwîste ku em behsa kirinêñ Fransiyêñ emperyalîst jî bikin.

Pê erîş û texrîbatêñ ku Fransiyâñ dijî Suriye meşandine şûn ve pêwîste ku em behsa Pêvajoya Darbeyêñ Leşkerî jî bikin. Bêguman pêwîstî heye ku behsa pêvajoya Komara Yekbûyî ya Ereban jî were kirin.

Wek din jî pêwîstî heye ku pêvajoya piştî

pêwîste werin ziman. Û her wiha pêwîste ku behsa kirinêñ qirêj çi rejîma Beşar Esad, çi Dewleta Tirk a faşîst û çi jî Kurdêñ Spî yên ku bi dil û can hevkariya Erdoxan dikin jî bi kirinêñ xwe yên piştî ku Kurdêñ azadîxwaz bi dilek û bi werekiyek mezin şoreşek li 19 Tîrmeh 2012 bi derxistin jî bi hemû tazî bûyîne xwe werin ziman...

HER KES BI RIHÊ SEFERBERÎ TEVLÎ BIBE Û BIKEVE TEVGERÊ

J bo hemî xebatkar û sempatîzanê TEVGERA CIWANÊN ŞOREŞGER

Rêhevalên Hêja!


Doza me ya azadîyê di pêvajoyekî dagirtî û dîjwar ê encamê wê pir girîng û dîrokî re derbas dibe. Li ser welat, gel û doza me ya azadîyê êrişen pir beralî û tarîxî ê pir berfireh a îmha û qirqirinê tên pêşxistin. Li hemberî van êrişen topyekûn ê Aberxwedanî û tekoşîn, di serî de di şexsê Rêber Apo de, bi awayekî seferberî di şexsê gelê me yê bi rûmet û egîdên vî gelê ên qehreman li Zagros, Metîna, Zap, Avaşîn, Heftanîn û di hemû qadêن azadîyê de, berxwedaneke bê hempa û berfireh a dîrokî tê pêşxistin. Di vê berxwedanîya bê hempa ya hebûn û rumetê de, em tevgera ciwanên şoreşger wek hêza pêşeng, dînamîk a tekoşîna azadîyê pir erk û berpirsiyariyên girîng dikevin ser milên me. Em wek ciwanên welatparêz ê xwedî rûmet, egîd di vê berxwedaniya bê



hempa de cih girtin, pêşengtî kirin, giringiya rol û misyona xwe fehmkirin ji bo me pêwist dike. Li hemberî dijminê bê exlaq, dem hatiye ku ciwanên vî welatî girêdanbûyîna bi dozê, biryara xwe dayîna xuyakirin û ketina tevgerê nîşan bidin. Erkekî wisa pîroz li benda me ciwanên şoreşger e, wek mecbûriyetekê ji her demê zêdetir û girîngtir li ser milê me ê ciwanên Rojavayê Kurdistanê ye. Li ser van esasan di çarçoveya pêngava tevgera me, ya "Dem Dema Azadîyê ye" de tevgera me ya ciwanan jî pêngava "Werin Cenga Azadîyê" daye destpêkirin. Em bang dikan her kes bi rihê seferberî tevlê bibe û bikeve tevgerê.

Rêhevalên Hêja!

Dewleta faşîst, dagirker a Tirk û hêzên hevkar, noker bi rê û rîbazên şerê psikolojîk



Pêwîste em vê baş bizanibin ku her kêtî û dema kû em disekezin, ji qırqırına ku li ser gelê me ferz dîkin xizmet dike. Ev jî ji bo her ciwanekî vî welatî cihê şermê û rû reşiyê ye.

dixwazin ciwanên vî welatî ji derveyî vê tekoşîna hebûn û rûmetê bihêlin û biqedînin. Bi salane ev polîtikayên tê pêşxistin li ser me ciwanan texrîbatê mezin hiştiye. Bi pasîv hiştinê dixwazin teslîmîyetê bisepînin ser gelê me. Pir rehet bi bin xistina ciwanan re bi ajantî û xerabîyan, ji nîrxên vî gelî ê azadîyê durketin, bi rêya lêgerîna jiyana sexte û xeyalên wê, bê bandorkirin, ji alîyê exlaqî ve xerabûn pêşxistin, hêviyênen gel ê azadîyê û pêşerojê bandor dike. Di vê bingehê de li ser ciwanên vî welatî, li hember hebûna gel û nirxên me, êriş û polîtîka tê pêşxistin. Ciwanen vî welatî her kû pasîv dimînin dibin hevkar û lîngên van polîtikayên faşîstan. Bi ketina nava çirava fuhuş, maddeyên hişber û ajantiyê, bûyîna dijminê cewherê xwe tê pêşxistin. Bi hedef girtina îradeyê, hafize û bê nirx hiştinê re, girêdayî azadî û berxwedanê tu îrade namîne. Dixwazin ciwanen ku ji fikir û ramanen azad bê par biminin ava bikin, bê rûmet û bê namus bikin. Bi polîtikayên şerê taybet dijmin dixwaze ci bi afirîne? Armancen xwe li ser ciwanan ci ne? Pêwîste rast bêñ fehmkirin. Eger ciwan bê bandor be wê dijmin bi rehetî polîtikayên xwe ê qirkirin û îmhayê pêk bîne. Di vê bingehê de ciwanen vî welatî ji berxwedanî û exlaqê civakî durxistin, ji kevneşop û pêşerojê qutkirinê re, xistina pozisyon û rola av kişandina aşê faşizmê esas tê girtin. Her ciwanekê vî welatî ê kû ji bo berxwedanî û çalakiyê

naherike û nakeve tevgerê, di bin bandora van polîtikayên dijmin ê faşîst de ye û jê re dibe xizmetkar. Dijmin di ciwanan de taybetmendîyên tirsonek, dudilî, xemsar û keyfî di rih û psikolojî de çê dike.

Da ku armancen xwe pêk bîne. Bi vî rengî hêza dînamîk a pêşeng ji derveyî xeta rûmetê a berxwedanî tê hiştin. Di heman demê de bi nexweşî, qirêjî û feraseten lîberalîzmê ve kesayetê ez ez, bexîl, cahil, berjewendîperest, egoist û xeyalî pêş dikeve. Ji feraseten wek kolektif, hevpar, komunal, difikire, xulîqkar, adil, civakî, rûmet û haysiyetê nirxen civakî dur dikeve. Zihniyeta devletparêz rêvebirina wê a civak û bi taybet ciwanan dispêre, bi şêwazê koledarî, bilindkirina ajo (Xerîze) ye. Ciwanan bi rêya ajo li gorî çilekî û xwestekan û ketina nav lêgerîna jiyane berjewendî perest re bindixe, ji rîexistinkirin, hest û feraseten azadîyê dur dixe. Di van salen dawî de bi rêya polîtikayên şerê taybet anîne rewşek wisa kû îradeya ciwantî hatiye şikestin û teslîm girtin. Ji berxwedanî û jiyana bi rûmet hatiye durxistin, qutkirin. Em vê bizanibin ku ji dîrokê ve, ev hemû wek polîtikayên desthilatdarî, li ser ciwanan dixin merîyetê. Di roja me iro de ev pêkanînên desthilatdarî hemû civak girtiye nav xwe, nirxen exlaqî ê civakî dirîzîne. Di encam de ji derveyî şerten jiyana biyolojîk grêdayî jiyanê tû tiştek nehiştiye. Bi vî şêwazî nifşekî tirsonek, teslîmbûyî dijminê gel û kedê tê avakirin.



Ev polîtkayêñ taybet ji bo ciwanan û bi taybet jî ji bo ciwanêñ welatê me têñ pêşxistin. Pêwiste em vê baş bizanibin ku her kêlî û dema kû em disekezin xizmeta qirqirina ku li ser gelê me ferz dikin e. Ev jî ji bo her ciwanekî vî welatî cihê şermê û ru reşiyê ye. Egîd û Gerilayêñ vî gelî di şert û mercen herî zehmet de berxwe didin, koka dijmin diqelînin, wê demê pêwîste ciwanêñ vî welatî, bi taybet ciwanêñ Rojavayê Kurdistan, Bakûr-Rojhiltê Sûrî, ji sekin û berxwedanîya qehreman a gerîla, ku li Zap, Avaşîn, Metîna û bi giştî li heremên parastîna medya derdikeye holê jê re bûyina bersiv, wek erk û berpirsiyariyêñ demê û sekin û berxwedanî bibîne

Rêhevalêñ Hêja!

Koledariya sedsalan pêwîste bê derbaskirin. Pêwîstiya xwe, baweriya xwe bi jiyana azad anîn, nîqaşa vê kirin û li ser esasê xwe ikna kirinê bi berfirehî destgirtin û çalakiya wê dayina destpêkirin lazime. Li şûna zor û zehmetî kirina hincet, dev jê berdan, ez nikarim, nabe de, di bingeha dahûrandinê felsefîk de, bi awayekî mezin bi xwe bawerkirin, bi hêrsa mezin ya sedsalan, bi kînek mezin û rihê

tolhildanê pêşketin jiyan kirin, rêya raste. Wek xeta ciwan, di ser me re li dijî gel û nîrxêñ me sepandina îmha û qirkirinê vala derxistin û bersivêñ pêwîst dayîna dijmin, ji her demê zêdetir bi wate û girînge. Bi taybet di vê tekoşîna rûmetê de, ê herî dînamîk, xwedan derfet û dikare darbeyên herî mezin, soter li dijmin bide ciwanêñ rojavayê kurdistan û Bakûr-Rojhilatê sûrî, wek ciwanêñ şoreşger pêwîste hîn zêdetir bi zanebûna berpirsiyartî bikeve tevgerê. Dem hatiye ku ji faşîstan û dagirkeran û bi cesaret em çi bikin, xwe daye xuyakirin. Ev jî li pêşıya me wek ciwanêñ şoreşger berpirsiyartiyekî jiyanî ye. Çav, rûh, mejî û baweriya Rêbertiya me, gel û fedaiyêñ azadiyê li me ye. Pêwîste em vê ji bîr nekin, azadî ançax bi tekoşîn û şer tê destxistin. Ev jî bi ketina nav tevgerê û serkeftinê çêdibe. Çiqas em bizanibin bi ser bixin ewqas em dikarin azad jiyan bikin, xwe ji qirêjiyê xelas bikin, rewşen ji xwe ne bawerbûnê derbas bikin. Ev ji bo her ciwanekî vî welatî rewşekî pêwîst ê

xwe bigihîne van lêgerînê

**Çiqas em bizanibin bi ser
bixin ewqas em dikarin azad
jiyan bikin, xwe ji qirêjiyê
xelas bikin, rewşen ji xwe ne
bawerbûnê derbas bikin.**





bingehîne. Pêwîste em bizanibin ku ev şerê man û nemanê ye, ji bo em vê jiyanê qezenc bikin lazime em hertim û ji her alî ve xwe pêş bixin. Ji bo ciwanan rewsên şilobûn, ne zelalî nêzîkatiyênu ku dijmin har dike ye, politikayênu xwe ê faşist bi rehetî dikare pêk bîne û civaka me ber bi îmha û teslîmbûyîne bibe. Sekn û helwesta rast di vê pêvajoya dîrokî de, berxwedanê bilind kirin û serkeftinê qezenc kirine. Bêguman berdelê wê jî çi be emê bidin û ciwanênu Kurd ti caran ji berdêla azadiyê netirsyanê û bi fedayane canê xwe jiber azadiyê de dane. Di salvegera şehadeta rêheval Zîlan de, em gotina wê ya bi nirx û dîrokî: "Ez dixwazim bibim xwediya jiyanekî bi rûmet û çalakiyeke mezin. Ji bo ku ez ji jiyanê û mirovan pir hez dikim, ez vê çalakiyê pêk tînim" ku ji me hemî ciwanênu Kurdistanê re fermane, dixwazin bi bîr bînin.

Rêhevalên Hêja!

Wek Ciwanênu Şoreşger rûxmê hemû nebesiyan jî, hêzekî bingehîn a ku dijmin bihejîne, derketinênu mezin bike, ji Kurdistan û Rojhilata Navîn re pêşengtî bike çêbûye. Ciwanênu Rojavayê Kurdistan û Bakûr-Rojhilatê Sûrî xwedan îrade û potansiyeleke derketina dîrokî ne. Ji bo vê jî têra xwe mîrate û tecrûbe hene. Bersiva

pêwîst dayina faşist û dagirkeran ji bo me sedema bingehîn a jiyanê ye. Bi vê hest û zanebûnê ketina nav çalakiyê pêwîst dike. Her ciwanekî vî welatî tiştekî ku bike heye. Bes mirov ew jiyanâ bê rûmet red bike ! li şuna wê jiyanâ bi rûmet esas bigre. Di tekoşîna ku topyekun tê pêşxistin de, em cihê xwe bigrin. Di asta pêşengtî de em erk û berpirsiyârî bigrin. Bi rêxistinbûyîna xwe, em jiyanê li dijmin û hevkaran bikin jehr. Em ji hemû kesî re bidin xuya kirin ku wê li welat jiyan bi rumet û azad çêbibe. Û ku dest bavêje vê, wê bibe hedefa ciwanênu vî welatî. Bi vê îrade û baweriyê pêngava "Werin Cenga Azadîyê" ji bo her kes berpirsiyartî bigre bangawaziye. Di welat de her ciwan pêwîste cihê xwe di nav vê berxwedaniya rûmet û kerametê de bigre. Ciwanênu Kurdistanê ji bo xwe jiyanâ bê rûmet tu carî qebul nake. Di nav refîn tekoşîna azadîyê de cihê xwe girtinê re wê xwedî li erk û berpirsiyârînu xwe derkeve. Teqez wê hesabê mezin ji dijmin bipirse û di pêşengtiya "Cenga Azadîyê" de cihê xwe bigre.

*Bijî berxwedana gerîla a fedayî
Bijî rihê ciwan ê cenga azadîyê
Bijî serok APO*

Bê

Têkoşîn bûyîn Ji

Jiyanê Qut Bûyîne

Bê Têkoşînbûyîn Ji Jiyanê Qut Bûyîne Ger li cihekî kesek kole hebe yan jî yê ku qet ji bo azadiyê ne di nava têkoşîn û şerekî deye, li wê cihê bêhêzî, mirin û teepsandin heye, ji ber vê yekê jî ev kes di nava civakê de an jî li kuderê dibe bila bibe weke belayekê tê dîtin, ji ber kesê ku bi vî awayî jiyan dikin weke nezanê jiyanê tênen bi nav kirin, ger însanek nezanê jiyanê be wê demê ne di xema kolebûyîna xwe de ye jî, bi taybet jî jin divê di vê mijarê de pir hesas nêz bibe, ji ber ku ger li cihekî jinek têkoşer û şerker hebe li wê derê mafê jiyanaz azad û wekhev heye, girêdanbûyîna jinê ya bi civakê re di têkoşîna wê de xuya dike, ji ber yê ku hevsengiyê jiyanê çêdike jin bi xwe ye bi taybet jî jina azade, mirov dikare bêje ku ger jin nebe wê pêşîya tevahî civak



